

BELGEYA ME YA DI DERBARÊ KOÇBERÎ Û PENABERÎYÊ DE

Em wek Yekbûyîna Ji Bo Demokrasîyê (DÎB) di derheqê pirsgerêkên penaberan û koçberîyê de bi kesên alîgir û pîsporan re nîqaş pêk anîn û me ji bo çareserîya van mijaran bernameyek çareserîyê derxist pêş. Em hemû kesen demokrat, partîyên sosyalist, sazî û sazgehan ji bo nîqaşên hevpar pêş bikeve û çareserîyek giştî pêk were vedixwînin sekneke hevpar.

Komîserê Bilind a Penaberan yê Netewên Yekbûyî (BM) Filippo Grandî, dîyar kir ku ji nîvê 2020 an vir ve li hemû cîhanê 80 mîlyon însan ji cîhê xwe bûne û wiha berdewam kir: “ Di nava 10 salên dawî de hejmara kesên ji cîhên xwe bûne û neçarî penbertîyê hatine kirin ji du qatî zêdetir bûye. Ev rewş jî dîyar dike ku hêza civaka navneteweyî ji bo parastina aşîtiyê têr nekiriye. Heger serokên cîhanê, pêşîya van pirsgerêkan negirin û li hemberê şer nesekinin mixabin ev rewş dê xirabtir bibe.” Em niha bi aloziyek gelemper re rû bir rû ne. Pirsgerêka penabertîyê û koçberîyê li hemû cîhanê belav bûye û êdî siyaseta cîhanê jî dîyar dike. Li hemberê kedkaran jî rewşa bêkarî, bihabûnî û newekheviyê her ku diçe zêdetir pêş dikeve. Siyasetmedarên tenê berjewendîyên xwe difikirin, ji bo sedema ev rewşa kedkaran jî kesên penaber nişan didin û jîyana penaberan zêdetir dixin bin talûkeyê. Siyasetmedar, îro kesên penaber ji bo polîtîqayên bazarkirinê bikar tînin û li ser wan gefan li dewletên din dikin. Di vê mijarê de pêwîste ku stratejîyek ragihandinê ya ewle bê bikar anîn.

- 1- Di demen dawî de êrîşên faşîzan ku li hemberê penaberan tê pêşxistin, ku herî dawî li navçeya Altindag pêk hat, dide xuya kirin ku rêxistinek navneteweyî pêwîst e. Lewre penaber, wek sedema pirsgerêkên aborî, civakî û demokrasîyê bin tînin nîşandayîn. Ji bo hemû kesên ku li ser axa vê welatî dijîn, divê mafên gerdûnî esas bê girtin.
- 2- Li Tirkîyê ji bo kesên penaber, pergala ku li ser esasen mafên mirovan hatibe ava kirin tune. Tirkîye divê îhtîraza ku ji bo koçberî û penabertîyê li ser Peymana Cenevreyê danîye rabike û pîvanên Peymanê ku di sala 1951 an de hatibû îmze kirin pêk bîne.

- 3- Mafê hemû kesan heye ku dema rastê zilmê û tûndiyê tîn koçberî welatek din bikin û parastina can û malen xwe bikin. Ji bo vê pêwîste ku rê li pêşîya penaberan were vekirin. Tirkîye, welatên Yekîtîya Ewrûpayê û hemû welatên din divê daxwaza penaberan a ji bo îltîcayê qebûl bikin û wan biparêzin. Peymana Pejirandina Vegerê ku di navbera Tirkîye û Yekîtîya Ewrûpayê de di sala 2013 an de hatibû îmze kirin divê bê betal kirin. Yekîtîya Ewrûpayê divê nêzîkatîya xwe ya li hemberî penaberan biguherîne û Tirkîyê jî wek wargeha penaberan nebîne.
- 4- Netewên Yekbûyî divê ofîsên ku ji bo pêvajoya mafê koçberî û îltîcayê birêve bibe vebike û penaberan bi awayek navneteweyî biparêze.
- 5- Li Tirkîyê jî pêwîste ku ji bo kesên dixwazin li vir bimînin polîtîqayên entegrasyonê têkeve merîyetê.
- 6- Ji bo karkerên penaber divê destura şixulê bê dayîn û di bin mûçeya asgarî de neyên xebitandin. Bi vê awayê wê pêşîya kedxwarina penaberan were girtin. Di derheqê karsazên kedxwar de jî divê doz were vekirin û pêşîya îstîsmara penaberan bê girtin.
- 7- Karkerên penaber jî divê karibin di bin banê sendîqayan de bi rêxistin bibin. Divê bi awayek legal pêşîya vê were vekirin. Sendîqa jî ji bo birêxistinbûyîna penaberan pêş bikeve divê amedakarîyên xwe xurt bikin.
- 8- Koçberî îro li tevahî cîhanê ji ber sedemên şerê ku welatên emperyalist pêk tînin, Qrîza îklîmê, birçîbûn, bêkarî û ji ber rejîmên otoriter pir zêde bûye. Mafê hemû mirovan heye ku di welatê xwe de di nava aramî û aşitîyê de bijîn. Divê serokên welatan, polîtîqayên xwe li gor vê rastîyê pêk bînin û piştgirî bidin van hewldanên bi vê rengî. Mafê kedkaran jî divê li hemû cîhanê bi awayek yekpare bê parastin û rêxistina kedkaran divê bê mezin kirin.
- 9- Welatên Bakûr ê cîhanê jî divê zêdetir xwedî li penaberan derbikevin û polîtîqayên piralî pêş bixînin. Tenê bi piştgirîya aborî pirsgirêkên koçberîyê çareser nabe û divê ev bar li ser hin welatan tenê neye hêştin.
- 10- Koçberî divê bi awayek ewle pêk were. Polîtîqayên bi vê rengê pêwîste ku zêdetir bibe û serokên dewletan divê nekevin hewldanên dijî demokrasîyê û penaberan ji bo van kirinên xwe wek hincet nişan nedin. Dema pêşîya van hincetan bê girtin desthilatdarên otoriter jî nikarin polîtîqayên xwe yê dijî demokrasîyê zêdetir pêş bixînin.

- 11- Divê polîtîqayên Osmanî û dagirkirinê ya li herêma neyê qebûl kirin. Li dijî van polîtîqayan pêwîste ku bi heremê re polîtîqayên hevpar bê meşandin. Pirsgerêkên heyî tenê bi vê rêbazê dê çareser bibe.
- 12- Jin û kesên LGBTI+ ku rastî tûndîyê hatine divê karibin bi awayek serbixwe cîhê îkameta xwe dîyar bikin. Tûndîya jin û kesên LGBTI+ dibinin divê bibe sedema îltîcayê. Ji bo vê pêwîste ku piştgirî bê dayîn û zagonên nû bê derxistin.
- 13- Pîvana nevegerandina welêt, divê ji bo jinên rastî tûndîyê hatine jî pêk were. Dewlet divê jina ku rastî tûndîyê hatîye û jîyana wê di bin xeterê de ye cardin neşîne welatê wê an welatek din.
- 14- Ji bo penaberên ku qeyda wan nehatîye girtin divê agahî û îstatîstîk were girtin û sazkerinên bi rêk û pêk çêbibe. Ji ber ku polîtîqayên îltîca û koçberîyê di zagonê de baş nehatîye zelal kirin pêşîya koçberîya îllegal jî nayê girtin. Ji bo pêşîya mirinên penaberan bê girtin, divê kesên qaçaxtîya koçberan dikin bîna ceza kirin.
- 15- Hin penaberên dilxwaz, li erden ku ji ber qrîza îklîmê vala maye dikarin bîna xebitandin. Lê divê heqê van penaberan bi awayek wekhev bê dayîn û ewlehîya wan pêk were.
- 16- Rêveberîyên Herêman jî ji bo çareserîya pirsgerêkên penaberan divê însîyatîf bigirin.
- 17- Polîtîqayên ji bo vegevandina penaberan dema bîngeha vê nehatibe ava kirin dibe sedema alozîyan û nayê qebûl kirin.

KORDÎNASYONA YEKBÛYÎNA JI BO DEMOKRASÎYÊ